3- Rewşa dawî ya bakûr û başûrê Kurdistan piştî geft û hereşeyên tirkan bo bezandina sinûrên başûrê Kurdistan çawa dinirxînin…?

B3- Ne cara yekê ye ku karbedestên Turkiyê diltengî û çavsoriya xwe derbarey pêvajoya rewşa kurdistana Îraqê bi tundî didine xuyakirin . Hêja ye em bînin bîra xwe ku , hê dema lihevkirina 11-ey Avdarê sala 1970 di navbera Bexdê û kurdan de , karbedestên Turkiyê bi her hawî dixewstin ku ew lihevkirina beravîtî bibe . Mixabin dixuyê ku , eger li Hind û Çînê jî kurd bi nav bibin , xwedî cî û war bin, dîsa jî , li ba rayadarên dewleta Turk dê bibe girêk û serêş .

4- Piştî serdana serok komarê sûrê beşar esed bo tirkîyê û piştgirîya wî ji tirkan re ji bo dagîrkirina başûr û lêdana pkk helwêsta partîya we çibo…?

B4- Helwesta Sûriyê bi hêla piştgiriya Turkiyê bona derbazbûna Kurdistana Îraqê li ba Parta me ciyê nerazîbûn û şermezariyê ye .

5- Aye raste kû mebesta tirkan çîyayê qandîle yan hindek armancên xwe yên nediyar hene…?

B5- Dewleta Turkiyê di Rojhilata navîn de , dewleteke mezin , xwedî dezgeh û hêz e, di NATo de endam e , li Afxanistan û Libnanê xwedî rol e…Vêca wê razî nebe ku li Îraqê bê roleke berçav û xurt be – weke çawa Îran li başûrî Îraq xwedî destekî dirêj e – lewre jî Turkiyê dixwaze pirsa çekdarên PKK li çiyayê Qendîl û hinde kiryarên wan bike eger û perde, da ku , derbazî nav xaka Îraqê bibe. Ragihandin û propaganada Turk gelekî jîr e, û dikare tiştan ji nîskê bike gîsk, da ku raya gîştî li Turkiyê û cîhanê li gor xwe bajo û rastiyan bervaja bike

6- Tirk çend mehên burî geft û hereşeyên pir dijwar li dijî serokayetîyên başûrê Kurdistan dikirin jib o cibecî nekirina xala 140 ya kerkuk û piştgirîya enîya tirkmanî li dijî xelkên kurd dikirin û îro jî bi bihaneya kuştina 15 serbazên xwe li şernaxê kû 100 km dûrî sinûrên başûre li ser destên, gerîlayên pkk geftan dike ma gelo bi bîr û remanên we tirk çi dixwazin….?

B6- Cîbecînekirina xala 140 bona Kerkûkê , daxwaz û hewildana gelek hêzan e , çi li hundir Îraqê û çi li derdorê , digel ku weke ez fêm dikim helwest û nêrîna Emrîkan û gelek hêzên dî derbarey pirsgirêka Kerkûkê, ne li gorî dilxwaziya kurda ye, ku xwedê giravî , Kerkûk jî weke Hewlêr û Silêmaniyê di çerçewa sînorên cografiya herêma Kurdistanê de be . Siyasetmedarên Anqerê vê yekê tê dighên, lewre jî Hukûmeta Anqerê şûrê xwe li ba dike û dixwaze hespê xwe bajo ser kurdên Îraqê . Di texmîna min de , dewleta turk neketiye kula mirin û jiyana çend memecik û serbazên ordiya xwe, ne jî kuştina leşkeran û kiryarên xwekujiyê , rê li ber çareserkirina pirsa kurd li turkiyê dûz dike.

7- Erdoxan bang li pkk kir dest ji çekan berdin û werin perlemanê lê piştî kû pkk li ser daxwaza serokê herêma Kurdistan mesûd berzanî û serok komarê îraqê celal telebanî û emerîka pkk careke din agir best ji yek alî de ragehand belam reyadarên tirkan ew agirbeste nepejrandin aye ev pirsgirê kçawa

D.R.(3)